rupel 1++.qxp_Layout 1 6.05.2022 18:08 Page 1



## Parastina Kurdistanê zexim dibe

Çiya li ser piyan e; yên ku ji dûr tên dibêjin 'em in ên raqîb û berberî ew çiyan e.' Belê ew war e, lê ne ew bihar e, kurd êdî ne kurdên zamanê berê ne. Rewş diyar e, plan berfireh û xeteriya li ser axa Kurdistanê ji hêla her kesî ve tê zanîn... ***Adar Gulan / R.2***



## Nalê azadiya Kurdistanê: Meqap

Zarokatiya min li gund derbas bû û heta lîseyê jî pezê me hebû. Herdu rojên dawiya heftê û mehên havînê ku dibistan tunebû, em diçûn ber mî û berxikan. Ji ber vê jî dema me pir zêde li çolê derbas dibû. Di van roj û mehan de min... ***Kadrî Esen / R.8***



## Dijminê kurdan

Seydayê Tîrêj di helbesta xwe ya Bilbilê Dilşad de dibêje "îro li me ferman e, li ser gerdenê şûr e''. Belê ev 200 sal in rewşa me kurdan wiha ye, em li dijî şûrê li ser gerdenê hertim li ber xwe didin, ew roj nehat ku em zirxê... ***Şîndar Akinci / R.2***

# xwebûn

9 - 15 GULAN 2022 HEJMAR: 125 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Kurdî jî mîna kurdan li ber xwe dide



Di 15'ê Gulana 1932'yan de hejmara yekemîn a kovara Hawarê li paytexta Sûriyeyê, Şamê derket. Kovara Hawarê wekî kovareke wêjeyî, hunerî û felsefeyê ji aliyê zimannasê kurd Celadet Alî Bedirxan û hevalên wî ve hate amadekirin. Lewre jî kurd roja 15'ê Gulanê wekî roja cejna zimanê kurdî pêşwazî dikin û her sal roja 15'ê Gulanê bi şêweyên cuda tê pîrozkirin. Bi boneya vê rojê û ji bo ku em... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

## Lêçûna şerê têkçûnê û 3 trilyon e

Pênasekirina têgehan gelek girîng e. Mînak şer, têgehek e û tê wateya pevçûna navbêra du hêzan, her wiha tê famkirin ku eger li deverekê şer hebe, li wir pirsgirêkek jî heye. Eger şer hebe li wir siyaset jî heye, eger şer hebe divê aştiya wî jî hebe. Ji destpêka dîrokê heta roja me ya îro şer ji ser dika dîroka mirovatiyê kêm... ***Piling Welat /R.7***

# Ev şerê man û nemanê ye

Şerê di 14'ê nîsanê de li Zap, Avaşîn û Metîna hatibû destpêkirin, 20 roj li pey xwe hişt. Berê jî çend caran li Zapê şerên dijwar rû dabûn. Lê artêşa tirk encam negirtibû. Fermandarê NPG'ê Mûrat Karayilan êrîşên dawî yên dewleta tirk û şerê gerîla yê li dijî dagirkeriyê destnîşan kir ku gerîla li Zap û Avaşînê zêdeyî 2 hefteya ne berxwedaneke mezin dimeşînin û got: "Tu doz biqasî doza azadiyê ya gelê kurd mafdartir nîn e. Bi vê bawerî û biryardariyê li dijî dijmin şer dikin. Ev şerê man û nemanê ye. Zap keleha berxwedanê ye. Serkeftin dê ya me be..." ***R.3***

## 'Qad di destê HPG'ê de ye'

Şerê li Zap, Metîna û Avaşînê bi hevkariya PDK'ê û cerdevanan didome. Di şer de li gelek deveran pevçûnên dijwar pêk tên. Li gorî daneyên HPG'ê heta niha zêdeyî 300 leşker hatine kuştin. Artêşa tirk ji 14'ê nîsanê heta niha ji hewayî û bejayî qadê bombe dike. Leşker û hêzên taybet ên PDK'ê nikarin li qadê bi cih bibin. Herî dawî 10 çawîşên pispor ên derûniya wan xera bû îstîfa kirin. Li gelek qadên ku leşker nikarin bi pêşde biçin cerdevanan wekî mertal bikar tînin. Cerdevanên ji malbata Hazim Babat û malbata Tahir Adiyaman ên tev li şer bûn, diyar kirin ku HPG'î bersîvên dijwar didin leşkeran û gotin: "Leşker paşve direvin. Li qadê asê mane, derûniya wan xera bûye. Nizanin gule ji ku tên. Em êdî naçin şer... ***R. 3***



## Hunermendê bêkêr

Li welatekî biyanî hunermend salê carekê hunerên xwe pêşkêşî padîşah û gel dikin û padîşah jî li gora hunera wan xelatê dide wan. Xelata hunermendê yekemîn sed zêr in, xelata hunermedê duyemîn pêncî zêr in û xelata hunermedê sêyemîn jî deh zêr in. Lê li wî welatî zilamek heye ku her tiştên wî ji yên civakê cuda ne. Hunera vî zilamî ne bi kêrî wî û ne jî bi kêrî civakê tê. Lê zilam jî xwe ji bona wê rojê amade dike, zilam derziyê di erdê de diçikîne û ta... ***Rıza Uyar /R.10***



## 'Hêza' xelata sêyemîn wergirt

Belgefilma Hêza ku çîroka jineke êzdî digire dest, di Mîhrîcana Xelatan a Filman a Jinên Serbixwe ya Los Angelesê de xelata "Belgefilma herî baş" wergirt. Festîvala Filmên Jinan a Serbixwe ya... ***R.11***

## Dêstpêkirin biryar, serketin encam e

Di gerdûna biserûber de hemû tişt û hêmanên ku hene xwezayî ne. Li ser rûyê erdê jî du hêmanên bingehîn hene; hêmanên xwezayî û hêmanên çêkirî. Hêmanên xwezayî, xwe bi xwe hatine/tên afirandin ango ji berê de hene. Hêmanên çêkirî bi destê mirovan ango ji hêla mirovan ve pêk tên. Bi vegotineke din; çi tiştên ku hene yên derexwezayî hemû ber berhemên mirovan in û ji hêla mirovan ve hatine/tên çêkirin. Tekane avakar, hilberîner û dahênerê sazî, pergal û damezrînerên ser rûyê erdê, mirov e. Mirov her tiştî bi destê xwe ava dike; bi destê xwe diaprêze û dîsa bi destê xwe xira dike. Bi vegotineke din; mirov hem afirînerê berhemên xwe; hem jî bende û derdestê berhemên xwe û hem jî têkbir û rûxînerê berhemên... ***Adar Jiyan /R.5***

## Şerê azadî û îxanet

Dewleta tirke heta serranê 1950an şaranê bînan reyde verva şarê kurdî zî qirkerdişo sûr da domnayene. Badê nê serran zî dest bi polîtîyaka qirkerdişê sipêyî-asîmîlasyonî kerd. Serranê 1960an ra dima Kurdistanî de dibistanê "helenayişî" (YÎBO) ameyî akerdene û nê dibistanî sey mengeneyê asîmîlasyonî ameybî bikarardene. Heta vejîyayişê Têgêrayîşê Azadîya Kurdistanî dewleta faşîste bi goreyê hesabê xo persgiraya kurde zî hel kerdbî. Bi vejîyayişê Têgêrayîşê Azadîye dewleta tirke nê hewnî ra heşîyar bîye û bi cuntaya 12ê Îlone waşt nê têgêrayîşî... ***Xoser Welat /R.9***

## Hevalbendên firotî

Li Şengalê ji 2014'an û vir ve gelek tişt hatin guhertin û hîn tên guhertin jî. Ev guhertin ji bo gelê herêmê bû ezmûneke biêş. Tevî hemû êş û azaran jî gelê herêmê bi armanca xwedî li hebûna xwe derkeve giranî da xebatên rêxistinkirina xwe. li ser vî esasî cara yekem civaka êzidî li gor bawerî û kevneşopiya xwe ya resen peragala xwe ya rêxistinî avakir. Di çarçoveya xebatên xwerêxistinê de sazî û dezgehên rêvebirî, rêxistin, parastin, civakî û çandî hatin avakrin. Li gel hêzên Yekîneyên Berxwedana Şengalê û Yekîneyên Jinên Şengalê hêzên Asayîşa Êzdixanê jî hatin... ***Felemez Ulug /R.6***

## Plana valakirina Şengalê pûç bû

Li ser daxwaza dewleta tirk û aligirê wan PDK'ê zextên li ser Şengalê berdewam dikin. Herî dawî pêşmergeyên PDK û alîgirên peymana 9'ê Cotmehê derewên mezin kirin û xwestin bi tirsandinê milet ji Şengalê derbixînin û koçber bikin. Di 30'ê adarê de artêşa Iraqê di navbera Şengal û Rojava de dîwareke dirêjiya wî 250'î kîlometre bû çêkir. Ligel van hêzên girêdayî artêşa hikûmeta Iraqê di 2'yê gulanê de bi hejmareke zêde leşker, wesayîtên zirxî, tang û obusan xwest bikeve navenda bajarê Şengalê. Lê li rastî berxwedana Asayîşa Êzidxan û hêzên YBŞ û YJŞ'ê hat. Pêvçûnên... ***R. 7***

rupel 12++.qxp_Layout 1 6.05.2022 15:02 Page 1

xwebûn

9 - 15 Gulan 2022 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 125

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Dîroka têkoşînî ra ju fîgur: Mîrza Axa



Dr. Îsmet Konak



Seserra XIX. de mabênê dewleta Osmanî û împaratorîya Rûsya de xeylêk şerî qewimîyayî. Rûsya îşxalkerdişê erdê Osmanî xo rê armancêk dîyar kerdbî. Aye bitaybetî waştêne ke Kurdistanî bigêro binê serdestîya xo. Na çarçewa de ge-ge bi tayê eşîranê kurdan têkilîyî viraştbî. Eşîrê sey Sipkî, Cemaldinî, Celalî, Redkî, Birûkî, Hasanî herêma Serhadî de tewrê tayê têkilîyan bîyî. Baxusus mabênê kurdanê Şemsedînovî û îdareyê çarîye de hemkarîya girse estbî. Mîsal Huseyîn Axayo Çokdeve (Çongdeve), Gulî Cafer (Cewer) Axa, Kasim Axa, Ahmet Axa Rûsya rê hetkarîye kerdbî. Gulî Cewer Axa, lajê ey Alî Eşref Beg, Ahmet Axa artêşa Rûsya de xeylêk şeran de wezîfeyê girîngî ardî ca. Oncîna eşîra Birûkî ra kalikê Kînyaz Kartalî Fethî Begî kî artêşa Rûsya rê xizmet kerdbî. Na babete de nimûneyî zaf ê.

Seba dîroka kurdan û rûsan şero ke 1828-1829î de ame ca wayîrê girîngîyêka girse bî. Nê serran Rûsya û dewleta Osmanî mabênê xo de şer kerd. Artêşa Rûsya Ahiska, Ahilkelek, Erzîrom, Qers û Bazîd îşxal kerd. Raverşîyayîşê rûsan bêguman bala tayê eşîranê kurdan ant. Bitaybetî no dem êzidîyan hetê îdareyê Osmanî ra xêylek tedayê dînî dîyêne. Ê sey "şeytanperestî" amêne namekerdene. No semed ra êzidîyê sancaxê Sêrtî kî Rûsya rê nêzdî bîyî. Sancaxê Sêrtî no wext giredayîyê eyaletê Bedlîsî bî. Zerreyê sancaxê de 7 qezayî estbî. Nameyê înan ra ju Rindwan bî. Goreyê tayê cigerayîşan nameyê Rindwanî birastî "Rendwan" o. Yanî kokê na çekuye kurdkî yo. Rindwan wextê şerî de fekafek 800 banan ra amêne viraştene. Qeza de zafî kurdê êzidîyî ciwîyêne. Înan ra teber armenîyî, asûrîyî û keldanîyî ciwîyêne. Mabênê nê nasnameyanê etnîkîyan de paştîdayîşêko balkêş estbî.

Rindwan de axayêkê êzidîyan xeyle nam dabî. Nameyê ey Mîrza Axa bî. Goreyê zanîştîşo ke hetê tarîxnas Celîlê Celîlî yeno dayene Mîrza Axayî rê "Mîrziko êzidî" vatêne. Mîrzik wayîrê otorîteyê girsî bî û Rindwan îdare kerdêne. Vera nasnameyanê bînan ey de toleranso hîra estbî. Mîsal ey Rindwan de dêrêk awankerdbî. Domananê ey perwerde bi armenkî girewtbî. Mabênê Mîrza Axayî û keşîş Ter Pogosî kî zaf rind bî. Dewleta Osmanî waştêne ke paştîdayîşê dînamîkanê Rindwanî birizna û na çarçewa de mabênê şaranê Rindwanî û muslumanan de dişmenîye ramitbî. Verê şerê rûsan û tirkan qewetanê Mîrzik Axayî û Ter Pogosî bi artêşa Osmanî tayê pêkewtişî kerdî. Netîceyê pêkewtişan de şarê Rindwanî serkewtbî. Nê serran kurdê êzidîyî yê Rindwanî vera Şêx Qasimî kî têkoşîn kerdêne. Goreyê notanê raywanîya arkeologê Îngîlîzî A.H. Layardî Şêx Qasim dewa Goya ra bî. Dewa ey serê raya Bedlîs û Cizîrî de bîye. Şêx Kasimî de vera êzidîyan dişmenîya girse estbî. Ey xeylêk dewê êzidîyî rijnayî û êzidîyî kiştî.

Key ke Rindwan de tedaya îdareyê Osmanî qewimîya, şerê 1828-1829î dest pê kerd. Artêşa Rûsya payîzê 1828î de Bazîd de verê Panosî de artêşa tirke mexlub kerde. Paşayîya Bazîdî kewtê binê serdestîya Rûsya. Raverşîyayîşê artêşa Rûsya seba şarê Rindwanî roştîyêka raxelisîyayîşî bî. No semed ra serdaran sey Mîrza Axa û Ter Pogosî waştêne hetkarîye bidê Rûsya. Nê konteksî de Mîrza Axayî bi fermandarîya artêşa rûsan tayê têkilîyî viraştî. Ey verî di temsilkarê xo rusnayî general Paskevîçî la ê bi destê tirkan ameyî qetilkerdene. Dima Mîrza Axayî mektuba bîne dê nuştene û pê Kîrakos Arakelovî rusne Erzîrom. Arakelov key ke zemherîya 1829î de rest cayê general Paskevîçî, general şîbî. Ûca de bi general Pankratyevî ame têhet. Mektube teslîmê ey kerdbî.

General Pankratyevî dima derheqê na mektube de raporêk amade kerd û rusna general Paskevîçî. Ey raporê xo de wina nuştbî: "Kîrakosî mi rê vat ke armenîyî, kurdê êzidîyî û Mîrza Axa seba îşxalê paşayîya Bazîdî yê Rûsya zaf bextewar ê. Eke hêzê rûsî aver şinê ê do bi qewetanê xo paştî bidê, Binê serdestîya Mîrza Axayî de fekafek 2000 qewetê êzidîyî û hende kî armenîyî estê."




General Pankratyevî bi rûskî mektubêke nuşte û pê Kîrakosî Mîrza Axayî rê rusne la kesî ziwanê rûskî nêzanêne ke biwano. Kîrakos Arakelovî qala nêzdîbîyayîşê germî û sempatîyê Pankratyevî kerd. Na mektube seba Mîrza Axayî bes nêbîye. Ey mektuba hîrêyine gulana 1830î de nuşte û pê di armenîyan Petros Xazarovî û Kîrakos Arakelovî rusne fermandarîya Rûsya. Temsilkarê axayî şîyî Erzîrom la general Paskevîç şîbî Tîflîs. Çike no taw şerê Rûsya û dewleta Osmanî qedîyabî. Mabênê di dewletan de Edîrne de peymanêke ameye îmza kerdene.

Seba teslîmkerdişê mektube temsîlkarî Erzîrom ra şîyî Tîflîs. Îta de Kîrakos Arakelov kolera ra şî heqîya xo. Petros Xazarovî rixmê zehmetîyan mektuba Mîrza Axayî daye Paskevîçî. Mektube bi armenkî nusîyaybî. Ser û binê mektube de morê Mîrza Axayî estbî. Muhtewaya mektube bi kilmî wina ya: "...Key ke mi eşnawit ti ame Panos, mi to rê mektubêke nuşte û pê temsîlkaranê xo rusne la heta nika to ra ne xebere ne mektube girewte. Serra ke ti ame Panos, ez, welatê mi, şaro êzidî û xirîstîyan zaf zerrewes bî. Na mektuba ke mi pê temsîlkaranê xo to rê rusne, mektuba hîrêyin a. Temsîlkarê verênî nêrestî to, wina aseno ke ê bi destê Osmanan ameyî qetilkerdene...Ti (general Paskevîç-İ.K.) çimeyê ma yê şerefî yê. Ti bizane ke nufusê ma şenik o la çimê dewleta Osmanî de ma zaf girs asenê. Heq ke ray dano 100 esparê mi bi asanîye 300 esparanê dewleta Osmanî eşkenê orte ra wedarê. Coka îdareyê Osmanî mi sey dişmenî vîneno. Ez wazena ti çîyo ke zerrîya mi de esto û armancê mi bizane. Ti padîşaxê mi, ez xizmetkarê to yo. Eke vengê to Baxeşê Bedlîsî ra yeno goşê ma yan temsîlkarê ma xebere danê ke heta Bedlîsî to her ca girewto o wext bi hezaran Heqî rê zaf sipas kenîme."

Goreyê kitabê Celîlê Celîlî derheqê cewabê Paskevîçî delîlêk çin o ke ey cewabê xo bi nuştekî rusno. Ey teyna dermanêkê çimî û hedîyeyêke dabî Petros Xazarovî. Çayê Paskevîçî çîyêko nuştekî nêrusna? Çike no dem mabênê di dewletan de peymana Edîrne ameye îmzakerdene û ey nêwaştêne têkilîyan xirabe bikero. Beşdarîyê Mîrza Axayî netîceyêkê musbetî neda. Seba şaranê Rindwanî hêvîya raxelişîyayîşî vîndî bîye.

Îdareyê tirkan birastî wextê şerî de Kurdistan de otorîteyê xo xeyle vîndî kerdbî. Seba restorasyonê serdestîye fermandaro tirk Reşît Paşa ame wezîfekerdene. Binê destê ey de 40 hezarî leşkerî estbî. Îşxalê Reşît Paşayî Kurdistan de 1833î ra heta 1836 dewam kerd. Rixmo ke Mîrza Axayî xo ver da, 1836î de ey serdestîya dewleta Osmanî nas kerde. Ey ra dima tayê eşîranê kurdan kewtî binê îdareyê tirkan.

Serra 1837î de fermandar Reşît Paşa rîyê kolera ra merd. Îdareyê tirke Mîrza Axa kî dawetê merasîmê cenaze kerd. Armancê ey kiştişê axayî bî. Axa ame xapitene. Key ke ame cenaze, qonaxê hetkarê walîyî de ame kiştene. Merdimanê Mîrza Axayî o girewt û Rindwan de defin kerd.

Têgêrayîşê dewleta tirke vera kurdan tim wina bî. Mîr Mûhammed, Mîrza Axa, Şêx Ubeydûllah, Sêy Riza mexdurê na polîtîkaya dirîye bîyê. A wazena ke kurdî bêwelat bimanê û tim îteat bikerê. A wazena ke kurdî heta peynîya dinya qayîtkerdoxê kelaya aye bibê la no nêzdîbîyayîş vera xozaya çîyî yo.

# Nûjiyana xweza mirov û bihara welat

Serdar Altan



*Zivistanê barkir û çû, êdî demsal bihar e.*
*Reng û rûyê mirov geş, ew ji mehan Adar e.*
*Baran hûr hûr dibare, lê binêre Nîsan e.*
*Li nav xweza şahî û cejn, ew der bûye Gûlan e.*
*Demsalên giran li paş man, vaye dîsa bihar e.*

Çiya û zinar, dar û ber, çem û rûbar, newal û deşt... Xwezaya Welatê me hetim bi xweşî û geşî mirov pêşwazî dike. Her demsalek xweşiya wê cûda ye. Lê dema bihar tê, Kurdistan dibe parçeyek ji bihûştê.

Çar demsal dibuhire li vî welatî. Her demsalek rengek nû bixwere tîne. Her demsalek xwezayê hembêz dike. Lê bihar keskesora demsalan e. Xweza bi rengê biharê dixemile û bi gûl û çîçekan, xwe ji nû ve avadike. Ji ber wê xweza şikirdarê biharê ye.

Vaye gul û kûlîlk şîn dibin, dar û ber pelên xwe vedikin. Zivistan jî çû, êdî demsal bihar e.

Bihar şahî û xweşiya xwe jî bi xwe re tîne. Raperîna xwezayê ye bihar. Her wiha ji bo mirovahiyê hêvî ye bihar.

Her çiqas bihar wek xwenûkirina xwezayê tê zanîn, ji bo mirovahiyê jî xwenûkirin e ev demsal. Kirasê tarîtiya zivistanê ji ser xwe davêje, dest bi jiyanek nû dike însan.

Kurdistan bi xweşî û geşiya xwezaya xwe navdar e. Xweza bandorek wisa erênî li ser mirovahiyê dike ku mirov bê xweza nikare jiyanek bi rêk û pêk bidomîne. Xweza feyz dide însan. Vîna xwezayê heye, jiyanê rengîn dike û bedew dike. Ji dîroka kevin heta niha mirovahî bi berhemên xwezayê jiyana xwe domandine. Ev xwezaya bêhempa, dewlemendiyekê jî bi xwere diafirîne. Ev dewlemendî bi biharê geş dibe. Wisa geş dibe ku dilê mirovan şanaz dike. Lewma bi her parçeyê laşê xwe li biharê xwe girtiye însan.

Dema bihar hat gul û çîçek, dar û ber, mêrg û zozan şîn dibin li her derê. Lê li Kurdistanê, bi taybet jî li ser çiyayên bilind Guldexwîn rûyê xwe vedikin. Ev jî taybetiyeke xwezaya Kurdistanê ye. Çiyayên bilind mazovaniya guldexwînan dikin. Guldexwîn sergula gul û kûlîlkan e. Lê vaye wê bi sedan curre kûlîlk şîn bibin li ser axa welêt. Wê li dora Guldexwînê bibin xelek. Bihar wê can bide gul û çîçekan, wê bibe keskesorek. Paşî li lat û zinaran û serê çiyan dar û ber wê ji xwe re jiyaneke nû biafirînin.



Hatina biharê bandoreke ewqas mezin li xweza û jiyanê dike ku ne pêkan e ew bêhn û rengên biharê neyên hîskirin. Rengên ku ji xwezayê diafirin, bêhna ku ji xwezayê tê, dide fêmkirin ku tiştekî cuda pêk hatiye. Ew guhertinên ku pêk tên jî carna tevî derd û kulên di mejiyan de dide jibîrkirin, carna jî hêviyên mezin dide afirandin.

Vaye qeşa dihele; gelî, çem û newal geş dibin. Xûşe xûşa kanî û rûbara ne. Dema dengê ava ku diherike bi dengê çûkan re dibin yek wê demê hatina biharê bêtir bedew dibe. Dar û daristanên ku bi dengên çûkên biharê geş dibin, bi pelên ku vedikin dibijên "bihara me jî hat."

Deşt û Zozanên ku rengê kesk wê dorpêç dike, êdî ji bo çêreyê amade ne. Bi hezaran kar û berxên ku nû zayîne bi kêfxweşî xwe davêjin qadên çêreyê.

Zevî û bostanên ku bi mehan di bin berfê de man, bi hatina biharê ji bo çandiniyê amade ne. Keda ku bi mehên Adar û Nîsanê ve despêdike, ji bo debara salê dibe hêviyeke mezin. Bi hezaran kes piştî zivastana dijwar li benda van rojan dimînin ku destên xwe yên kedkar bavêjin axa pîroz. Tovên ku di van mehan de bi axê re hevdu hembêz dikin ji bo berdewamiya jiyanê dibin çarenûs. Û êdî dem dema hilberînê ye...

Xweşî û bedewiya xwezayê ji mirovan re bûye cihê jiyanê. Çendîn kesên ku li van erdnîgariyan jiyîne, bi xwezayê re bûne dost. Çiyayên bilind wan parastiye di hembêza xwe de. Deşt û zozan bûne stargeh. Kelat û nebat wek nîmeta herî bi nirx li wan vegeriyaye. Vê xwazayê, welat bi her aliyê xwe kiriye weke bihûşteke jiyanê. Jiyan bi xweşiya welat bedew bûye. Vê bedewiyê bihar rengîn kiriye. Û vaye dîsa demsal bihar e...